Warum die Zeitung Kurdî?

Wir als die „Zeitung-Kurdi“ -Team haben schon seit längerem die Herausgabe einer deutsch-kurdischen Zeitung geplant. Unsere Motivation war und ist in erster Linie die Wiederbelebung und Erhaltung einer vom Aussterben bedrohten Sprache. Anlässlich des „Jahres der Sprachen“ brachte die UNESCO 2008 den Weltatlas für bedrohte Sprachen heraus. Insgesamt sind in etwa 3000 Sprachen der Welt bedroht und 11 davon allein in Kurdistan. Dies führt uns den Ernst der Situation noch einmal vor Augen. Sprache ist identitätsstiftend, Sprache ist kulturstiftend und beides sind Grundbedingungen für das „Selbstbewusstsein“ und somit das „Überleben“ eines Volkes. **Seite 2**


Zeitung Kurdî
Dezember 2009 Ausgabe 1
Kurdisch-Österreichische Zeitung für Kultur und Kommunikation
„Em Rojnameyaka pirr zimanî û dîalogîxwazin“
Çandveguherîn di navbêra Amed û Vîena da
Kulturaustausch zur Amed und Wien
Gaxand yeno, gaxande sima bimbarek bo!
Law law Josef te dît, Kurdên Austrî jî derketin!!!

Zeitung
Kurdî
Dezember 2009
Ausgabe 1
Kurdisch-Österreichische Zeitung für Kultur und Kommunikation

„Em Rojnameyaka pirr zimanî û dîalogîxwazin“



Wek te zanîn Rojnameyaka me Kurdên kû li Austrê dijîn tunne bû. Nêzikê deh salane kû li ser pêwîstîya vê dihat guftigo kirin.
Lê tiştekî wiha hetta îro derneket holê. Her wiha, wek te zanîn livir Radyoyên me jî hene, (li Viena Radîo Dêrsîm û li Lînzê Radio Mezopotamîa) lê dîsa jî, pêwîstîya zimannivîsî hîn zêde têt xûyakirin.
Jîyana me, kî dizane hetta kîngê li Austrê berdewam e. Ger wiha ye, ma em çima qelemekî nekin dest xwe(ko niha Laptop hene) û dîtîn û ramanên xwe bi zimanên xwe neanîn ser ziman! ***Rûpel 6***

Çandveguherîn di navbêra Amed û Vîena da

Kulturaustausch zur Amed und Wien



Amed; bixwe bajarekî pirrengînîyake Rojhilat a Navîn e. Her wiha li wir, Misilman, Ezîdî, Süryanî û Xiristîyan demên dirêj bi hevra jîyîn. Ew jî, ji bo diversîtät-vielfaltê bingehîyaka balkêş e. ***Rûpel 3***

Gaxand yeno, gaxande sima bimbarek bo!



Asma kanune de Dersim de gaxand amenê bimbarek kerdene. A roze domonu çêf û esq kerdenê. Eke mara raştîye pers kene sabîyayena ma domanan kî restene asmen. ***Pelgê 14***



Warum die Zeitung Kurdî?

Redaktion

Liebe Leserinnen und Leser!
Herzlich willkommen zur ersten Ausgabe von die „Zeitung Kurdi“.
Warum eine neue Zeitung?
Wir als die „Zeitung-Kurdi“ -Team haben schon seit längerem die Herausgabe einer deutsch-kurdischen Zeitung geplant. Unsere Motivation war und ist in erster Linie die Wiederbelebung und Erhaltung einer vom Aussterben bedrohten Sprache. Anlässlich des „Jahres der Sprachen“ brachte die UNESCO 2008 den Weltatlas für bedrohte Sprachen heraus. Insgesamt sind in etwa 3000 Sprachen der Welt bedroht und 11 davon allein in Kurdistan. Dies führt uns den Ernst der Situation noch einmal vor Augen. Sprache ist identitätsstiftend, Sprache ist kulturstiftend und beides sind Grundbedingungen für das „Selbstbewusstsein“ und somit das „Überleben“ eines Volkes.

In Österreich leben in etwa (genaue Untersuchungen gibt es nicht) mehr als 70.000 Kurdinnen und Kurden. Ein Großteil ist in die Migration gegangen, weil ihre kurdische Identität in ihrer Heimat nicht geduldet wurde und auch ihr Leib und Leben bedroht waren. Vielen Kurdinnen und Kurden ist es deshalb ein Anliegen, im Exil ihre Kultur und Sprache und somit ihre Identität zu wahren und für die nächsten Generationen zur Verfügung zu stellen. Es ist allgemein bekannt, dass die jüngere Generation der Kurdinnen und Kurden zwar die kurdische Sprache nicht gut beherrscht, aber eine hohe Motivation hat, sie zu erlernen und zu verbessern. Die Zeitung die „Zeitung Kurdi“ soll dazu einen Beitrag leisten.
Wir als die „Zeitung Kurdî“ -Team haben uns auch Gedanken darüber gemacht, wie wir alle in dieser Gesellschaft noch effektiver miteinander kommunizieren können. Aus diesem Anlass, werden wir versuchen, eine Drehscheibe für Informationen, Dialog und Miteinander sowohl zwischen kurdischen Migrantinnen und Migranten als auch zwischen der kurdischen und der österreichischen Bevölkerung zu sein.
Nur Vielfalt, Verständnis, Toleranz, Dialog, Solidarität, Gleichheit, Mehrsprachigkeit, Pluralismus und eine Sprache ohne Rassismus, ohne Fundamentalismus und ohne Unwahrheiten alleine können das Fundament für eine gemeinsame Zukunft legen.
Auch wir wollen und werden für diese „gemeinsame“ Zukunft unseren Beitrag ohne Wenn und Aber leisten. Daher wird die Zeitung Kurdî auf Deutsch und auf Kurdisch erscheinen.
Wir erhoffen uns bei unserer Arbeit eine breite Unterstützung, sowohl von Kurdinnen und Kurden als auch von Österreicherinnen und Österreichern und allen demokratischen Institutionen.
Wir wünschen Ihnen einen guten Rutsch ins neue Jahr

Ihr die „Zeitung-Kurdi“-Team

www.arsiv.org

Impressum

Gründungsdatum : Dezember 2009
GründerInnen : Bahtiyar Kahraman und Rohat Miran

❍**Herausgeber:** Art+Press Medien Bildungswerk ❍**Chefredakteur:** Bahtîyar Kahraman ❍**Kurmancî Editör:** Rohat Mîran ❍**Kirmançkî Editör:** Mag.Eren Kiliç ❍**Mitarbeiter/innen:** Metîn Can, Şahîn Okay, Hozan Delîl Xidir, Hüseyîn Şîmşek, Kadîr Sel, Îlyas Îrten, Saydo Barnas, Mag.Bakî Yildiz, Alî Dikme, Îhsan Azadî, Xidir Karataş, Mag.a Özlem Akar, Mag.Mustafa Akgün ❍**Grafik & Layout:** Art+Press ❍**Kontakt Tel (Kurdisch):** Rohat Mîran (0699 111 55 294) ❍**Kontakt Tel (Deutsch):** Metîn Can (0699 115 41 428) ❍**Office Adresse:** Sonnwendgasse 38, Lokal 2,1100 - Wien ❍**E-mail:** office@kurdi.at ❍**Home:** www.kurdi.at ❍**Bankverbindung:** Erste Bank, Konto Nr.: 291 140 93 500, BLZ: 20111



Dîmenek ji parlamena Austrê



Dîmenek ji Amedê

Çandveguherîn di navbêra Amed û Vîena da

Kulturaustausch zur Amed und Wien

Nûçe/Şahîn Okay û Rohat Mîran

Amed; bixwe bajarekî pirrengînîyake Rojhilat a Navîn e. Her wiha li wir, Misilman, Ezîdî, Süryanî û Xiristîyan demên dirêj bi hevra jîyîn. Ew jî, ji bo diversîtät-vielfaltê bingehîyaka balkêş e.

Ji alîya komîsyonê ve, agahîyek wiha gihîşte me.“Sal a ku bê, ango di 2010 an de Civat a Şaredarîya Vîena bi piranî, di navbêra Şaredarîya Vîena û Şaredarîya Amedê di meha Pûşberê 2009 an da biryar a çandveguherînê da.“

Ji bo çi?

„Şarêdarîya Vîena berê jî bi şaredarîyê bajarên din ve tekîlîyên xwe wiha hebûn. Di hundirê Civata xwe da gihîştin merhaleyaka nû û dan nîşan kû; Amed; bixwe bajarekî pirrengînîyake Rojhilat a Navîn e. Her wiha li wir, Misilman, Ezîdî, Süryanî û Xiristîyan demên dirêj bi hevra jîyîn. Ew jî, ji bo diversîtät-vielfaltê bingehîyaka balkêş e. û niha jî, Amedê carekî din ehtîyaca projekeya wiha heye“

„Vîena bi ti bajaran ve ne bajarekîhevbiratî ye. Ti prensîbên xwe wiha tunnin. Lê bo çandveguherinê her dem vekirî ye. Hetta niha, bi Sarajevo, Stockholm, Rom û Pekînê ve projeyên wiha çêkirin e.”

Ji alîya Şarederîya Diyarbekirê ve jî Osman Baydemîrî, biryarake wiha pirr bi qedîrşînas dîtî ye û spasîya xwe ji Şaredarîya Vîena re şandî ye.

Di meha Gelawejê 2009 an de, Wezîrê çandê a Parêzgeha Vîenayê Dr. Andreas Mailath-Pokorny û Lijneyaşaredarê(Gemeinderat) Ernst Woller, serokê komîsyon a çandê û bi keseyatên din ve, hevdîtînek çekirin. Div ê hevdîtînê da, dîtîn û ramanên her du alîyan gihîştin hev û planên xwe çekirin.

Gava yekemîn 2010 an de bê avitin û Şaredarê Dîyarbekîrê bê wexwendin.

Ê çi bikin?

Li Vîenayê bajarê Amedê wek çand û turîstîkî bêt naskirin.

Ji kesayetên ji nav vê Komîsyonê serdanîya Amedê bikin.

Pîşewer û hunermendên ji Amedê ê li Vîenayê berhemên xwe bidin nasîn.

Grub a Zarokên Amedê li Vîena ê konsertekê bidin.

Dû nivîskarên ji Amedê, bi nivîskarên Vîena ve, şev a xwendinê bi dar xin.

Bi wêneyan naskirin a Amedê çebibe.

Û çand a Vîena li Amedê bêt naskirin.”

www.arsivakurdi.org

Kiliçdaroglu li Viena hat şermezar kirin

Nûçe / Ilyas Erten

Komeleyên Yekîtîya Alevîyan li Austrê di dema 22ê Çiriya Paşîn 2009 an de Kemal Kiliçdaroglu wek axaftwan wexwend Austrê. Kilicdaroglû, di vê axaftinê de, Li pey Onur Öymenî sekinî û got; „Onur Öymenî şaş hat femkirin“ Em niha li paş vê şaştê binêrin, gelo çawa Kurdan Onur Öymenî şaş femkirin em wê deynîn ber çavan.



Çawa têt zanîn, Dêrsim yek ji berxwedanên mezin yê milletê Kurd a li Bakûrê Kurdistanê.

Wekî eyan e, erda ku Komara Tirkîye li ser ava bû, di warê etnîkî da pirrengî bû. Lê hukumeta Tirk piştî Lozanê xwest hemû gelên nav sînorên xwe bike Tirk û jê milletekî pêk bîne. Ermenî di berê da hatibûn kuştin û revandin. Romî jî bi piranî piştî Şerê Pêşîn ê Mezin koç kirin çûn. Man gelên misilman, ango Kurd, Tirk, Laz, Çerkez, Ereb û hwd…



Mistefa Kemal û hevalên xwe xwestin hemû gelên Misilman bi darê zorê bikin Tirk. Zimanên hemûyan qedexe kirin, tu maf û azadî nedane wan û li ser derewan dîrokek ava kirin… Di nav van gelên misilman da tenê Kurd bi xurtî dijî vê sîyasetê derketin. Ji ber ku Kurd di nav sînorên Komara Tirk da xwedî welateke mezin û taybetî bûn, her usa jî Kurd bi hejmara xwe ya mezin gel û milletekî cuda bûn.

Bona vê yekê Kurd piştî Lozanê ji sîyaset û helwesta hukumeta Tirk aciz bûn. Berxwedanên Kurdan (Serhildana Şêx Saît, Grîdax û yên din) bi du hev hatin, lê bi êrişên mezin yên dewleta Tirk hatin vemirandin û dijî Kurdan qetlîamên mezin çêbûn. Bi vî awayî destê dewleta Tirk giha hemû cîhên Kurdistana Bakur, ji bilî Dêrsimê. Dêrsim hîn bi serê xwe bû. Çekdar bû û bi têrî xwe bac û leşker nedida dewleta Tirk.

Piştî vemirandina şoreşa Girîdaxê dor hatibû Dêrsimê. Hukumeta Tirk di sala 1935'an da navê Dêrsimê guhart, kir Tunc Elî. Di sala 1936 an da serokwezîr Celal Bayar pirsa Dêrsimê anî parlamena Tirk, got "Dêrsim wek kunêrekê ye û divê bê jêkirin û avêtin!" Di sala 1937 an da leşkerê Tirk bi çar alî va dora Dêrsimê girt. Di çapemenîya Tirkîyê da hat nivîsandin ku leşkerê Tirk li dora Çemê Miradê manewra dike û "hêzên kesk û şîn lîstikên şer pêktînin…"

Lê bi rastî ordîya Tirk bi tevî top û firokên şer êrişî ser Dêrsimê kir. Dêrsimîyan cî û cî bi xurtî ber xwe dan, bedêleke giran dane êrişgeran. Lê di dest Dêrsimîyan da tenê tifingên kevn hebûn û têr cebirxane jî tune bû. Êrîşgeran tevî topbaranê û bombayên ezmanî, çekên kîmyewî jî bi kar anîn. Dijî xelkê ku ketibûn şikeftan (piranî jin û zaro) gazên jehrî bi kar anîn. Cî û cî bi şewitandina puş û pelaxê ew bi dûmanê kuştin. Xelkê ku teslîm bûn kirin rêzê gulebaran kirin, pirî caran bi singîyan kuştin û avêtin çeman. Bi vî awayî bi dehhezaran kes kuştin, bi dehhezaran jî koçberî rojavayê kirin di gund û bajarên Tirkan da belav kirin. Serokê berxwedanê Seyît Riza, lawê xwe û çend merivên xwe li Xarpêtê hatin dardakirin. Bi vî awayî berxwedana Dêrsimê vemirandin.

Bi vî awayî li temamîya Kurdîstana Bakur ji bo demekê bêdengîyek çêbû, qasî bîst salan. Dewleta Tirk usa hêvî kir ku êdî dawîya tevgera kurdî hat. Lê ev hêvî pûç bû. Pir ne borî tevgera kurd cardin geş bû xewên zordestan revand.


www.kurdiyar.org

Salveger a helbestvanê me : CEGERXWIN

Nave xwe dike Cegerxwîn û bi vî navî jî te naskirin. Helbestên xwe li ser derd û êşên Kurd û Kurdistanê, li ser şoreşgerîyê û li ser xwendin û hînbûyine dinivîse.

Nave xwe yî rastî Şexmusê Hesen e. Di sala 1903 da li Merdîne li Gundê Hesare bi dayik bûye. Di 15-16 an salîya xwe da Dê û Bavê xwe winda kirê.

Li ba xucik(xwîşk) û biraye xwe jiyana xwe bi şivantîyê derbas dike. Lê ev li cihe xwe nasekine diçe Amedê, dikeve medrese û bi meletî hîn dibe . Dî vî demê da li alîyên Kurdistanê digere. Bi gor dîtîn a wî, „ji Meletî ti xêr nayê“ wî û we jî dihele û jîyana xwe dike rêya tekoşîn a gelê xwe.



Di sala 1932 an da helbestên vî di kovarên ko Celadet û Kamaran Bedir- Xan bi nave; „Hawar, Ronahî û Roja Nû „ derdixin, çap dibin. Duvre derbas a Surî dibe. Li wir komînîstan nas dike û bi wan ra kar dike.

Li Surî bi hevalên xwe va „Malbata Ciwanên Kurd„ ava dike. Lê ji demekê şûn ve kolonistên Fransizî wê sazî qedexe dikin.

Piştê demekê ji hevalên xwe ên komûnîst jî xêr nabîne û heta dawîya jîyana xwe li ber xebata welatperwerîyê disekin e.

Nave xwe dike Cegerxwîn û bi vî navî jî te naskirin. Helbestên xwe li ser derd û êşên Kurd û Kurdistanê, li ser şoreşgerîyê û li ser xwendin û hînbûyine dinivîse.

Cegerxwîn ne tenê helbestwan e. Gelek berhemên wî jî hene:

Tarîxa Kurdistan (1-2-3-4) ,Gramara Kurdî, Ferheng, Folkro Kurdî, Destan a Derwêsê Evdî, Bavê Tecro, Jîyan a Min û Gotinên Pêşîyan

Ev niviskar û hozanê gele Kurd, di 26 Cirîyapêşîn 1982 da diçe ser dilovanî ya xwe.

Îsal salvager a Cegerxwîn e. Bi temamî 26 sal derbas bûn e. Lê evê, bi berhemên xwe û bi ronakî ya xwe hertim di nav gele xwede bijî.



Kadir Sel

Integrations- und Diversitätsangelegenheiten (MA 17)

Rojname Kurdî

‚Firsed û îmkanên me li vir gelekin. Emê van îmkanên xwe bi zanêbûnê bi karbînin.‘

Dema kû hevalên Bahtiyar û Rohat telefonê min kirin û li ser derxistina rojnameya Kurdî axafîn, ez gelek şad û bextîyar bûm. Ez caradin li ser fikiriyam, kû Kurd li Evropa gehiştîna merhalekî zanebunê.

Rewşenbir û ronakbîrên Kurd li Evropa wek meşa hingivin.

Sal û dewran derbas bûn e, civata Kurd pirr peşva çûye. Dem hatiye şanûçicên xwe dadînin. Dem hatiyê embar û petagên xwe çêdikin. Dem hatîyê kes nikare rêya me bigre! Em li vir serbest in, em li vir azadin. Îmkanên me, firsendên me zedenê. Çima îmkanên xwe ji bo rojnameya Kurdî seferber nekin?

Belê, pêş sî salan vir da tenê bi tenê destê kesên sîyasî an ji tevgerên sîyasî dikaribun rojname û kovaran derxînin. Ew monopolekî tevgerên sîyasî bûn. Lê ew monopol şikest. Baş bû. Perspektîvên rojnameyên tevgerên sîyasî teng bûn. Misleheten tevgerî li ser her tiştî bûn. Le îro ew nema. Xwezî li Kurda be!

Dem û dewran xwe guhert. Û baş guhert. Xewn û xeyala Kurda gav bi gav têne cîh.

Derxistina rojnemekî bi Kurdî barekî giran e. Jê ra gelek kar lazim e. Bê piştgîrî, bê alîkarî nabe. Karên pirofesyonel lazim e. Bi kurtî, konseptekî rêkûpêk hewceye.

Îro, li Viyanê gelek rewşenbîr û ronakbîrên Kurd dijîn. Hejmara me roj bi roj zêde dibe. Çima rojnamekî me jî nebe. Ji destê me nayê? An jî em nikarin? Hinek kom dikarin nêzîkî bîst rojname bi zimanê daykê biderînîn. Lê dîsa jî me Kurdan yek rojnameka me bi zimanê me nîne. Ewa çi tiştekî ecaîbe. Ji alîyekî ve şîyarbun û hîsên Kurdewarî gelek pêşketiyê. Gelo ew ne paradokse?

Ew hîs hêzekî xûrt dide me. Bi piştîvanî hemî asteng û mişkule bên halkirin.

Firsed û îmkanên me li vir gelekin. Emê van îmkanên xwe bi zanêbûnê bi karbînin.

Rojnameya Kurdî bi alîyê ziman, çand û hûnera Kurdî da jî mîsyonekî bileyîze. Lê bi vî awayî ji ihtîyaç û tengasîya Kurda jî bîne ziman. Pirsgirekên civata Kurd li Viena bide ber çawan. Munazereyên zanîstî li ser meseleyên rojane bike.

Em hevîdarin kû ev karê hevalan bi serbilindî bi ser ke ve.

Ez caradin hevalên kû ew karên giran hildane ser milên xwe, pîroz dikim.

Di navbêra kû me dest bi karê Rojnameya Kurdî kir, ji Fransayê jî nûçeyek pirr giranbiha li ser internetê gihîşt me… Kurd li her deverên Evropa karên baş dikin. Gava kû min bîhîst Kurdên Evropa rojnameya frensî a bi nav û deng LE MONDE-Diplomatîkê bi Kurdî derdixînin, gelek kêfa min hat. Min ji xera got, ew çi xeberekî xweş e! Ew çi karekî pîroz e! Heta niha Kurdên Evropa di warê rojnamegerîyêda tiştekî wisa giranbiha nekirin.

Pêş sî sal virda me karekî waha keleş tesevur nedikir. Lê belê xewnên me yên xweşîk û renginî hebûn. Karekî wisa balkêş û konkret ne dihate bîra me. Le îro Kurdên Evropa ne tenê LE MONDE-Diplomatîkê, çend rojname û kovarên din jî sedûsed û rasterast bi Kurdî diweşînin.

Serkeftinê dixwazim…

www.arsivakurdi.org

DOSAR

„Em Rojnameyaka pirr zimanî û dîalogîxwazin“

Saydo Barnas

“...Pêwîsta bi Kurdîyaka sivik û zelal ve xebat bêt avakirin. Ez pirr kêfxweş û dilşa me. Ez hêvî dikim, nivîskarên vê Rojnamê, bi zimanên xwe bifikirin û bi-nivîsin.Ji ber kû; bi zimanekî biyanî(tirkî, erebî almankî û hwd.) fikirîn û duvre jî ver-gerandina ser zimanên me, dewlemendîya zimanên me winda dike. Pêwîste em vê rastîya xwe jî bidin ber ça-ven xwe.“



Wek te zanîn Rojnameyaka me Kurdên kû li Austrê dijîn tunne bû. Nêzikê deh salane kû li ser pêwîstîya vê dihat guftigo kirin.

Lê tiştekî wiha hetta îro derneket holê. Her wiha, wek te zanîn livir Radyoyên me jî hene, (li Viena Radîo Dêrsîm û li Lînzê Radio Mezopo-tamîa) lê dîsa jî, pêwîstîya ziman-nivîsî hîn zêde têt xûyakirin.

Jîyana me, kî dizane hetta kîngê li Austrê berdewam e. Ger wiha ye, ma em çima qelemekî nekin dest xwe(ko niha Laptop hene) û dîtîn û ramanên xwe bi zimanên xwe neanîn ser zi-man! Hinek ji nav me, dikarin bêjin, „em nizanin binivîsînin“ Rast e, ma gelo ewna nikarin, li ser telefonan bi me ra biaxifin jî… Na ez bi wê bawer nakim. Ko yek mîrovek tenê bi carekî jîyana xwe di nav Kurdan de derbas-kirî be, ew êdin îflah nabe û ti caran jî vî zimanî ji bîrr nake. Ez bivê di jîyana xwe da bi nasim…

Em di nav kûltur(çand)a Austrê da tekîlîyên xwe berdewam dikin. Em distînîn, difroşin, dixwînin û dinivîsî-nin… Lê ka em bisekinin û lixwe binêrin, gelo em çi didin kultur a vî gelî? Dibe kû, ev Rojnameya me bo ve jî bibe platformek…

Li ser vê prosesê cara yekem, em dû kes; dawîyê jî em çend hevalên me yên hêja ve hatin ba hev. Me biryar(qerar) da û îro jî ew rojname niha di dest we da ye. Hêvîdarim, emê biserkevin. Çimakî, her hevalê me, ji dil û bi rih ve ket nav vê xebatê.

Rojnameya Kurdî, ji hemû komel, partî, rêkxistin û ji bandora kesayatan (person) ve azad e. Ew hebûn û ne-bûn a vê platformê ye.

Em hevalên ko li Büroya PresArt-Media hatî cem hev, me dîtîn û ra-manên xwe wiha anîn zimên:



Rohat Miran

“...Bo min, hêvîyek bû. Iro ez bi vê hêvîya rojanî ve dilşa û dilxwezim. Ez hêvîda-rim hemû gelê me ên li Aus-trê, xwe bigihînin me û xwe bi vê xebatê ve parva bikin. Ew bo gelê me ên li Austrê dijîn, serfirazîyeke.

www.arsiv

Metin Can

"...Nivîskar dikarin bi her zaravayî û zimanên kurdan binivîsinin. Dibekû, kes li kesî tajangan (hakaret) neke.. Rojnameyaka demokrat xwesteka min e. Bila înformatîf be û pêwîstîya nivîsên dirêj tunne. Lê dîsa jî, ez dixwazim di vê rojnamê da Lîteratûr a Kurdan jî bibînim."



Hüseyin Şimşek

"...Dibekû, bibe rojnameyaka rojanî. Pêwîste carna nivîsên provakatîf jî hebin.. Bila kî çi dixwaze bikarebe, binivîse... Em Rojnameyaka pirr zimanî û dîalogxwazin."

Rojnameya Kurdî, ji hemû komel, partî, rêkxistin û ji bandora kesayatan (person) ve azad e. Ew hebûn û nebûn a vê platformê ye.

Kadir Sel

"...Herkesek nikare bi zimanên kurdan bixwîn e û binivîsîn e. Bo wê pêwîste, wêne zêde bibin. Hetta kû ji dest me da hatî, bi peyvên sivik û vekirî binivîsinin."

Şahin Okay

"...Kurd li Austrê, zêde bi îdentîteya xwe nayên naskirin. Dikarim bêjim, sedîheyştê Kurd wek tirk an jî wek farisîyan tên nasîn. Bila êdin ne bes e ko em xwe bi hebûn a xwe serfiraz bin."

Em wek Rojname Kurdî Serokkomarî ya Heinz Fischerî a duwemîn ji niha ve pîroz dikin!

Eren Kılıç

"...Pêwîste em alfabeya Bedîrxanîyan bidin ber çavên xwe.. U gelê me yi li Evropa û li Austrê dijî, hîna vê alfabê bikin. Kî alîkarîya vê Rojnamê bike, bila ji alîya me ve bên xeberdarkirin. Û em herin ba wan û xwe bidin nasî."

Nûçe- Heinz Fischerî (71) namzedîya xwe bi videokê li ser Internetê eşkerê kir û ji bo hilbijartina serokkomariyê, caraka din namzedîya xwe danî. Wek te zanîn kû, di meha Avrêl(April) 2010 an da hilbijartin a Serokkamarê heye.

Namzedîya Serokkomar Fischerî ji bo partiyên dî jî sûrprîz nebû, Partîya Gelê Austrê(ÖVP), Keskan (Grünen) û Partîya Azadîya Austrê(FPÖ) hetta niha ti kesek ji namzedîya partiyên xwe ji raya giştî re eşkere nekirin.

Wek kû rojnamên Austrê jî dinivîsînin, namzedên partîyên din li hember Heinz Fischer ti şansên xweyî mezin tunin.

Di hêladin de, hinek şexsîyetên di nav ÖVP de jî alîkarîya namzedîya Dr. Fischer dikin.

Her wiha keseyatên wek rojnamevan Hugo Portisch, di nav komîtaya hilbijartinê da ji bo serokkomar Fischer alîkarîye dikin.



Serokkomar Heinz Fischer

Heinz Fischer sîyasetmendarekî bi nav û denge. Di navnetewê da ji tê hezkirin, di alîya dîplomasî ye û ji bo kare aborîya navnetewê rolekî mezin dileyîze.

Ew jî te vê maneyê kû, Dr. Heinz Fischerî carekî din bibe serokkomara Austrê.

Bahtiyar Kahraman

"...Helbet, profesyonalîteya me heye, lê bo Rojnameyaka bi zimanên Kurdan, em hîn nû ne. Emê di rê da fêr bin û bi alîkarîya gelê me yî li Austrê û dostên me yî li vir dijîn, pêş ve kevin. Hevî ya me mezin e."

www.arsiv

„Em wek sazî bi hijdeh(18) zimanan kar tînin“

‚Xebatên me zêdetir bihevra jîyîn e û ji hev fêmkirin e‘

Rohat Mîran

REBAS 15 çîye û li ser çi xebatê dike?
Saydo Barnas: **REBAS 15 ji tîpên pêşîn yên (Regionale Beratungsstelle für Ausländische Schüler/innen) pêk te.**

Ew xebat ji kû/ ji bo çi derket?
Her wiha, sîstema dibistanên Austrê bi alîyê dê û bavan ve nayê fêmkirin. Em bi zimanê zikmakî înformatîonan didin. Ew ji bo zarên ku zimanê wan ne almanî ye û ji bo ên di dibistananda zehmetîyên fehmkirinê dikşîne ye.

Karê we bi taybetî li ser mîgranta ye?
Erê xebata me zêde bi mîgrantînan re ye. Li ser sîstema dibistanan, întegratîona zarokên li dibistanê û li ser kar û barên sosyalî û hiqûqî ye.

Li hemû mintiqeyên Vîena heye gelo?
Na. Tenê ji bo 15 û 7 an.

Çend xebatkarên vê xebatê hene? Ji kîjan welatan hatina Austrê?
Çar (4) xebatvanên bingehî (esasî) hene. Ew jî bi rojê, 8 seatê kar dikin. Û pênc(5) jî alîkarên me hene. Ew jî, di hefteyîkî de, 2 an jî 3 seatan li ba me kar dikin. Hemû jî, memostên zimanê zikmakî (Muttersprachlicher Berater) ne. Em wek sazî bi dehûheşt(18) zimanan kar tînin. Xebatvanên REBAS 15 ê ji donzdeh welatan hatin e.



Li rojê çend kes serdana we dikin?
Kêm-zêde nêzikî bîst-bîstûpênc kes serdana me dikin. Lê belê hinek rojan ji pêncê zêdetir kes tên ba me.

Xwendewan alîkarîyake çawa ji we dibînîn? û malbatên xwendewanan ji we û ji karê we razî ne?
Xebatên me zêde bo serketin a dibistanî ye. Problemên malbatan jî beşek ji xebatên dibistanê ye. Ji ber vê yekê xebata me pir fireh e. Em problemên dibistanî û problemên malbetên zarokan -kû em wê wek problema sosyalî bi nav dikin- ji hev cûda nabînin. Ew her dû jî, ji hev nayên veqetandin. Malbat ji me razî ne, çimakî ew xebat bîst salin kû, berdewam e.

Hûn, asîmîlatîon (bisavkerî) û entegresyonê (biyekbûnî) çawa ji hev cûda dikin?
Xebatên me zêdetir bihevra jîyîn e û ji hev fêmkirin e. Gor dîtîna me, asîmîlatîon û întegratîon tiştên pir firehin. Em xwe wek alîkar dibînin û divê çarçoveyê da disekinin. Her wiha bi zimanê zikmakî alîkarîyê dikin. Ew te vê wateyê kû, asîmîlatîon di nav vê xebatê de tunne.

Pirsa dawî, kîjan ji we, fêra zimanê hevalkarê xwe bû?
Em çar kesên bingehîn, bi zimanê hev rind hîn nebûnîn. Lê dîsa jî her yek ji me, bi çend gotinên zimanê hev dizanin.

Û Kekê Saydo, tû dikarî bi wan zimanan bêjî “Rojnama Kurdî bi xêr hat”

lê belê cawa nikarim!
Dobrodošli !
Huan Ying !
Mirë se erdhe !

Hevpeyvîn nav me... Yek ji n

Saydo Barnas(56),ji Araratê, bi salan e ko li Austrê dijî(35 sal) û serî xwe li ser zimanê zikmakî(kurmancî) dieşîn e. û her wiha, karekî baş li Vîena diweşîn e. Di vî xebatê ko ew dike, zimanî xwe yî zikmakî jî dide ber pêşîya xwe û malbatên kurdan re, bi zimanî kurmancî jî alîkarîyan dike... Dem hat, em dikarin bêjin, ko em dereng jî man.Bo çi dereng man? Bi salana Kurd li Austrê dijîn, xwe wek Kurd didin nasîn lê haya kesî ji wan tunne. Tekîlêyên me bi hev re qûtin. Em derengîya xwe bixwe nasînê man. Ew bibe sedem ko em hevdû hîn zêde nas bikin.



Tradationelle Kurdische frauen kostüme Zeichnerische Darstellung kurdischer Frauen aus Yozgat (links), aus Preveza (mitte) und Chios (rechts), spätes 19. Jahrhundert, Illustration aus Zur Geschichte der Kostüme von Braun & Schneider, 1861-1880 München.

Spor

Serokê FC Barcelonayê doza serxwebûna Katalanyayê kir

Joan Laporta: Xeyalek min heye!

Serokê FC Barcelonaya ruh û sembola Katalanan a milletbûnê eşkere kir kû ew doza dewletek serbixwe dike.

Joan Laporta diyar kir kû, yek ji xeyalên wî ên herî girîng ew e kû milletê Katalan li dewleta xwe, xwe bi xwe birêve bibe û ew ê bi vê xeyala xwe bi şev û roj bixebite. Laporta bi berdewamî got ew dewleta serbixwe bi taybetî bo zarokên xwe dixwaze.

Hejayî gotinê ye û di sala 2013 de li Katalanyayê di vê derbarê de referandûmek pêk tê û dê katalanî di vê referandûmê de biryar bidin bê ew ê serbixwe yan li gel Spanî û gelên din yên Spanyayê bijîn.

Ji Parlamentoya Baskê vebûna fûtbolê; Parlamentoya Baskê piştî 42 salan ji bo maça netewî a kû li Bilbaoyê bilîze pêşniyar li hikûmeta Spanyayê kir.





AMEDSPOR ava bu!

Li Amedê çend kes hatin ba hev û Komela Sporê a Amedê ava kirin.

Rêwerber a Amedsporê ji heft kesan pêk te. Wê rêwerberê(lijne) serdana xwe li 4 ê meha Rezberê (September) li Mudurîyata Parêzgeha Diyarbakirê kir. Li ser navê Lijneya Amedsporê Yilmazî got; “Emê di qîrêja Kapîtalîsmî de, bi rengekî û zimanekî nû derkevin seyranê. Em xwe hemberê vê çilvirisi (dejenerebûn) û wek alternatîf dibînin û hemû ciwanên Kurdan wexwendina vê seyranê dikin”



Ziman şahî û ramanî ya jîyana me ye!

Metîn Can

Em Kurd, di wî alîda pirr zahmet dikşînin, ji ber ku zimana dayika me yî şêrîn ji me girtin û zimanekî biyanî bi zore bi me hînkirin.



Di nav zindîya jîyanê de mîrov, hêsên xwe, daxwazên xwe, fikrên xwe bi zimane xwe qise dike an jî li ser kaxizê dinivîsî ne.

Gor dîtin a min, mîrovan cara yekem bi bangazîyan du re jî bi lorînan, û bi helbestan derd û êş, kef û xweşîyên xwe anîne ziman...

“Herçi kû şêx in, herçi kû mela û mîr in
Herçi kû derwêş in, herçi kû dewlemend û feqîr in
Kes tune kû, ji rindîyê ra nebe xwestek û dilxwez
Kes tune kû gihîştîna cem yarê ra nebe daxwez.”

Ew gotaran, gotarê nivîsarî me yî herî mezin Ehmedê Xanî ne. Zimanekî, vekirî, sivik, hêsdar û dilsoz...

Lewra, zanyar dibêjin kû, di zikê dêya me da di hefteyê 25 an da sifte lebata (orxana) guhdariye pêş ve diçe. Û cara yekem, em dengê dayika xwe dibihîzin. Dura jî dengê malbatê yani dengê der û dora xwe dibihîzin. Loma, bi zimanê me ra „zimanê dayik/dê“ te bi nav kirin.

Dîsa zanyar dibêjin hevîra mîrovan di navbera 0 - 6 salî da ava dibe. Bi îmkan û xwendinê, ango bi perwerdeyî hunerî insanî te hole.

Kes nizanî surr û halan
Ez dinalim meh û salan
Ax ji deste cavxezalan
Kes bi hale min nizanî

Hozane Kurd Feqîyê Teyran bi zimanê dayika xwe, derde dile xwe ciqas baş îfade kiriye.

Em Kurd, di wi alîda pirr zahmet dikşînin, ji ber ku zimana dayika me yî şêrîn ji me girtin û zimanekî biyani bi zore bi me hînkirin. Vê zordestê, pirr ruxandineka(xerabîyeka) mezin li ser me kirê ko, ewqas sal derbas bûne dîsa jî hîn tesîra wê neheqî li ser gele me û li ser me ranebû ye. Her zimanek dewlemendîyek e û gor rastîya xwe şêrîn e.

> ***” Îro bi hezaran ziman winda (zay) bûn e, bi hezaran jî di bin xeterê da ne. Heger kes xwedî lê dernekevin, ê winda bin. Yek ji wan, zimane me yî sêrîn kirmanckî ye. “***

Dibe ko em xwe bixwe xwedî derkevin, zimanên xwe biparêzin û di nav xwe da bikin zimanê taybet û rojan e.

Wek kû nivîskar û helbestvanê Kurd Cegerxwîn jî di helbesta xwe da dibê, heger em nexwînin, emê bibin bindestê neyaran.

„Xwendin nebe kes nace pês
Peyda dibin pir derd û ês
Her dem dibin destê neyar
Em dê dibin xukî û bês.“

Ziman şan û nîşan a mîrov û şan a netewitî ye jî... Dema kû du însan(mîrov) raste hev tên, ji hev dipirsin; “nave te yî bi xêr?” Û tu ji kîjan neteweyî yî? Ne wiha!

Ew te vê watê (mahnê) kû, zimanê dayîka te, nasname te, îdentîta te çi ye? Ewna jî lîteratur a me û çanda me didin nasîn.

Lê mixabin, em Kurd di vî alî da pirr sist in. Raste zimane me bi zordarîyan ji dest me girtin. Lê niha? Kîyê bêje kû, imkan û derfetên me nînin. Ne rast e, derfetên meyên îro, ji ên her demê zêdetir in. Pêwîste, em xwedê li van derfetan derkev in û zimanên xwe bikin zimanên zindî û rojan a.

Giranîya ziman di jîyana mîrov da tiştekî jîyanî ye.Ji bo vê jî me xwest, bi zimanê dayîka xweyî şêrîn him xwe baş îfade bikin, him jî civata kû em tê da dijîn baş fahm bikin.

Gotinek heye dibêjin; „gotinên xweş bihara dila ne“ emê ji bi zimanê şêrîn gotinên xweşik binivîsîn.

Du armanca rojnamya Kurdî hene:

A yekem; bi alî ziman ve dîaloga navbera kurdan û zarên kurdan xurt kirin e. Di vê rê da, ziman û lîteratûr a kurdan ji kurdan re nasandin a. A duyem; dîaloga navbera gelê kurd û gelê Austrê xurt kirin e.

Hêvîdarim emê biserkevin, pêwîste kû gelê me û dostên me jî alîkarîya me bikin.

Rexne û pêşnîyarên xwe ji me ra bêjin kû em pêşve bikevin. Kêmasîyên me ji me ra bêjin kû em bi hevdû re civatekî modern, sosyal, aştîxwaz, zana, û vekirî bin.

Di dibistanên Austrê da hîn waneya(unterricht) kurdan tunne ne!

Nûçe / Saydo Barnas

stadtschulrat für wien

Di dibistanên Austrê da perwerdeya zimanên dayikî jî tên dayîn. Wek mînak: bi tirki, sirbski-xirvatî-bosnakî, erebî, çeçenî, roma-sintî û bi çînî.

Mamostên wan bi alîya dewleta Austrê ve tên girtin û pereyên wan jî bi alîya dewletê ve tên dayîn. Ev di sîstema dibistanên Austrê da bi qanunî ve hatîye giredan.

Şêrtên perwerdeya bi zimanê dayikî evin:

-Dê û bavên zarokan, formeke ji bo perwerdeya zimanê xwe tijî dikin û daxwazîya xwe didin nasîn..

-Grupek ji donzdeh (12) zarokan hebe û daxwazîya dê u bavan jî hebe, perwerdeyaa wî zimanî tê dayîn.

-Giringe kû ji bo perwerdeya zimanên kurdan mamostek jî hebe.

Erê, li Austrê imkanên perwerdeya zimanên kurdan hene.

Li pirs ewe kû, wextêk kurd zarokên xwe dişînin dibistanê, nabêjin kû ew kurdin û nabêjin kû zarokên wan dixwazin perwerdeya bi zimanî dayikî jî bixwînin.



SO-BÊ

Bakî Yildiz

Jû mordem hetê Dersîmî, Mazgerd ra bîyo, u waxt kî şoresger ma, kitab wendenê binê tesir de çerx dênê.
Pilunê ma vatenê; bira bira baqil vinderê. Na şîyayena sima rind nîya.
Înan kî vatenê; sima cahîlîyê, sima çi zonenê çi çiko?
Rozê jü Apê ma, teselîya xo kewta, şîyo nîya vato;
- Nêro vane jü kitab hetê Rusya ra amo, domonê ma wanene. Çitur kî wanenê hen benê bom
sonê. Gune mordem no kitab destê inan ra bijero, eke dest ra mecerê, nî pero benê bom sonê.

SCHNITZEL - FISCH - KEBAP
SoLiMo
Mo - Fr. 08.00 - 22.00
Sa - So. 10.00 - 22.00
Mobil: 0699 111 55 294
Tel.: 01/403 99 37
Josefstädter Strasse 59, 1080 - Wien

„Derd her ca de derdo“

Rojname ma ra albozê ma Bahtiyar Kahraman röportaje kê hunermend Hasan Sağlam de virast, sima wendaxane xo de kemê bare.



Miletê ma letewo jêde ebe wastena xo nêamo îta. Coka derd û kederê ma zafo. Naca peynîya dugeluna, xerîbîye girana, bêkeşîye zora. Sarê ma eke zonê xo de, yakî welatê xora kilamî, şuwarî gosday, zerrê xo benê letey.

Bahtiyar Kahraman

Ti onca ama Avusturya, ravêr, ti xêr ama. Nî serranê pêyenu de seweta konseru û sewu xeyle rey ama Avusturya. Ferqê mabenê gosdarına îtay u yê welatî çiko?

Xêr mîyan de bê bıra. Nika naye torê vacî, îson ke welatê xo ra vecîya, dîna cirê xerîbîya, kot beno bibo. Miletê ma letewo jêde ebe wastena xo nêamo îta. Coka derd û kederê ma zafo. Naca peynîya dugeluna, xerîbîye girana, bêkeşîye zora. Sarê ma eke zonê xo de, yakî welatê xora kilamî, şuwarî gosday, zerrê xo benê letey. Sarê mayê ke Tirkîya de weşîya xo ramenê, î ke xerîbê bêkesê, bêzon bêwayîrê. Uza de kî sekê kilamî gosday çimê xo benê pir. Coka van; xerîbîye her waxt xerîbîya.

Dersîm de zerre her çêy de tomir esto, çê sıma dekî tomir bî?

Zeke ti vana, zerrê çeyî de tomir kosewu pak de dardekerdenê. Piyê mi feqir bî, mira ravêr çê madê tomir çîne bî. Mi kî zaf meraxê tomir kerdene. Cîranu ra muso. Peydona mi xorê tomir herna. 13 serrî bîyo, ez tomir cinitene musune. Mi şuyarî îmîs kerdene, hona qizkek bîyo. Ucara nat mi endî xorê na kerdê huner. Honde ke desteberami amê, kilamunê xo cinen û van...

Na rozu onca tertelê hîrîsûheşt (38), Dersîm sero qesêy vejîyay, ni qesu serro, vatena tu çika?

Serê na dîna de awa ke ma dîye zerrê ma de bîye dirbete. Ma serê harde xode neşkîyayme ke weşîya xo biramîme, marê kerdê tometê. Ma hardê xora vejîyayme. Eke şîme kotî onca marê kerd serevde. Mara xeber (milqî) vatî, mara qesêy vatî. îftirey soynay ma. ma kar nêguretime, bonê xo marê kîra nêday. Ma qirkerdîme, surgin kerdîme, honakî vanê ke; ma neq nîmê. Nu haqe sima sene haqo ke, no xora sima ra has keno. Sima serê na dîna gonî ra kerd sur, hona wazenê ke mayê ma onca biberbê. Mayê ma, dakilê ma, wakilê ma zaf berbay. Ez van ke; ti zona bego; mawunê ma, domonê xo, eve xo dest ra xenekit. Zerrê îson damîs dano bego?

Cencê ke Avusturya de hunerî sero gurînê, hona newe vejîyé rayê. Înurê çi salix dana?

Nu kar karo de rindo. Mordem hunere xo sero rind bigurîyo. Ma tarixe xo nî huneru ra musayme, kilamu ra musayme. Kirmanciya xo sero, welatê xo sero rind bigurîye, biwane, binusne, kokimu ra pers kere, bimuse.

Wendoxunê rojname rê zovîna vatena tu esta?

Na gure sima zaf rindo. Tedinê rê xêrlî bo, ez zaf sa bîyo, wazen wendoxe sima pê qayil bibê. Tedînê rê silam û hurmet. Bimane weşîye de.

www.arsiv.org



Xidir Karataş

Moderator von
Radio Dersim
und SO BÊ
auf OKTO TV

Mîjdan, mîjdan, mîjdan!

Gama de newîye. Avusturya de jü roznamîya de newîye vejîna. Hometê ma têdîne rê xêr bo. Viyana de hata ve nika, eve zonê ma ra her roza bazare, binê Radyo Orange 94.0 FM de Radyo Dersîm 10 serrîra jêdero pêl dano. Jü kî 2006 ra nat zerê Okto TV de programe eve zonê ma virajîno. Namê xo „So Bê“ wo.

Na rozname de destêbera kamîde ke çi yêno, va eve zonê ma binusno. Nayeke na xizmete hometê marê kenê, dest û payê dînu derd mevînê. Ma zoneme ke, seveta na kar û gurêy, xeyle waxt û xeyle zametu oncenê. Emegê dînu hêçe nêşêro. Î kî xizmeta xora xêr bîvînê. Îtîqatê ma hên yeno ke, xizmeta dînu hêçe nêsono. Domonê ma ke înu ra taye çî musene. Eve na tore zonê ma rê, odet û torê ma rê bena roşt. Ma ke beme sa.

Rojnameya Kurdî her keşî rê xêr bo. Cirê wayîr vejîyo.



Mag. Eren Kılıç

Geschäftsführer / Bilcom
(Weiterbildungsinstitut)

Ma be xêr dî

Hawo çi waxto vame ke, zonê ma ra jü rozname bivejîme. Hama her ke yême pêser, qese uza de, serê xonca de maneno. Her kes oncîya xo onceno eskeftê xo. Xêyal kerdene jê her dayîm sarê ma ra nêqirfîno. Heya endî nu xeyal beno raştîye, raştîye beno nuste.

Ez hawo des û ponç ser bî amune welatê Vîyana. Vînen ke welatê xo ra xeyle milet, çêyê xo bar kerdo, amo îtawu mekan gureto. Naynu ra letê ra jêde yê mayê. Dersîm u Gêxi ra, Erzîngan u Xarpêt ra ustê ra amê, îta. Çi hêf ke, nînu ra kes endî zonê ma u pîyê xo qesey nêkeno. Rawa kalîk u pîrîka xo berdewam nêkeno. Îtîqatê hardê Duzgînî hazetê nînu de nîyo. Nî jê kengerê verê vaye, bîyê vila şîyê.

Naye ra tepîya, sima rê îta ra veng dan. Ma weşîya xo de çi xeletîye keme, çi rast keme, eve nîyayedîsa xo an verê qelema xo. Wastena mi awa ke, ma îta, tenê berîme xo ser. Wayîre xo bîvecîme. Wayîrê zonê u kulturê xo, îtîkat u kamîya xo, hama her çî ra raver, wayîre domanunê xo bivecîme.

Sima zonenê, ez hawo des serro ke eve Radiyo Dersîm sima rê eve zonê ma bernamewu virazen. Her roza bazarî, satê 18:00 de dest keme ci u hata 20:00‘ine qedeneme. Heştê ez be bira Hidir Karataşî u bira Qemer Söylemez pîya some u hêşta bîne kê bira Îlyas Îrten virazeno.

Di hazaro sês (2006) ra nat ke televizyona Okto de asme de rêy bernamewu virazeme. Name xo So Bê’wo.

Umud ken ke sima pê nî bernamewu qayîl benê. Karê ma zof çetino. Hama ez kê hometê ma ra, nî karu ser vengê de weşî bihesnî, o waxt çetînîya nî karî, hurundîya xo verdenê zerêweşîye rê.

Na rêy na nuste xo tenê kilm verden. En sifte ra sima meqefelnî. Naye ra tepîya veng u vazê newey ser, qese xo kêm nêkeme.

Ma butunî rê xêr bo. Emrê na roznameya ma derg bo. Bimanê weşîye de, hata reyna.



Ali Dikme

Ehrenamtlicher
Kulturvermittler
von Dersim

Heq be xêr kero

Hekmeta Vergê Kuresî

En rave van ke Rojnamîya ke nika sima dest dera xêr bo, heqe hometê sima têdîne rê xêr kero. Nara têpîya çike destebera ma ame, simarê na pelge de name Jîyar û Dîyaru, Kilam û Diwawu nusneme. Na ra têpîya zonê xora waneme, zonê xora nusneme. Kulturê îson zerê zonê îson dero. Zonê xo ke çînê bi, tore mîrçika bêper ro.

Zone xo bimise, zonê xora biwane. No ke fikre kamîyo, naye ke na komel



de gurênê, kam ke poşt dano ci, dînu perunê ra, Heqe homete rajî bo.

Kures zere Dersîm dero. Uzaxe Kuresî, bonê Kures Nazmîya (Qisle) dero. Bîlanune ma, marê qesey kerdenê, vatenê ke azê Kureş bîyene di-hîre serren, merdene. O waxt Kuresi cendegê domanunê xo mezele de defin nêkerdê. Juyo ke şîyene heqîya xo, şütene gorn kefen kerdene. Sondê berdene jü vile de nene ro, amene çê.

